

Çoban, B. (2021). Îdeolojî û Partîzanî di Romanên Kurdî yê Sovyetê da. *The Journal of Mesopotamian Studies*, 6 (2), 229-244, DOI: 10.35859/jms.2021.892810

MAKALE BİLGİSİ/ARTICLE INFO

Article Type/Makale Türü:

Research Article / Araştırma Makalesi

Received / Makale Geliş Tarihi: 02.01.2021

Accepted / Makale Kabul Tarihi: 08.09.2021

Doi: 10.35859/jms.2021.872810

ÎDEOLOJÎ Û PARTÎZANÎ DI ROMANÊN KURDÎ YÊN SOVYETÊ DA¹

Betül ÇOBAN

Arş. Gör. Zanîngeha Mardin Artukluê,
Enstîtûya Zimanên Zindî,
Beşa Ziman û Çanda Kurdî,
cbnbetul@gmail.com,
ORCID: 0000-0002-2715-9885.

KURTE

Piştî Şoreşa Cotmehê ya 1917an, li Yekitiya Komarên Sosyalîst ên Sovyetê (YKSS) hikûmeta nû dest bi xebatên çandî dîke û di 1934an da Yekemîn Kongreya Yekitiya Nivîskarên Kurdî û Di 2 Kongreyê da realizma sosyalîst bi awayekî fermî dibe nêrîna hunerî û dewletê. Nivîskarên Sovyetê bivênevê bi rêgeza vê nêrînê berhemên xwe diafirînin. Realizma sosyalîst bi çend rêgezan rû dide û yek ji wan jî îdeolojî û partîzanî ye. Realîstên sosyalîst ên ku bi vê rêgezê derdikevin qada hunerê berhemên bitez dinivîsin û hunera xwe dikin bin emrê doktrînekê an jî îdeolojîyekê. Tespîten xwe ji aliyê sosyalîzmê ve destnîşan dikin û bi awayekî zelal aliyekî îdealîze dikin û aliyekî jî reş dikin. Yekitiya Sovyetê rê li ber hemû miletan vedike ku ew bi zimanê xwe berhemên biafirînin, çand û hunera xwe bi girêdayî şert û mercên Partiya Komunîst vejînin. Kurdên Sovyetê jî ji van derfetên Sovyetan sûd werdigirin û dest bi afirandina berhemên dikin. Ev gotar di mînakê heft berhemên da taybetmendiyên xeta giştî ya realizma sosyalîst vedikole û rengvedana wê ya îdeolojî û partîzanî ya li ser van berhemên dide ber çavan di çarçoveya rêgeza vê teoriyê da. Ev dahûrîn rewşa

1 Ev xebat ji teza nivîskarê ya bi navê “Şopên Realizma Sosyalîst di Romanên Kurdî yê Sovyeta Berê da (1935- 1991)” hatiye nivîsin. Di 2nd International Academic Conference of the College of Languages/ Kurdish Language Dep. /Nawroz University, 2019 Duhok ê da hatiye pêşkêşkirin.

romana kurdî ya Sovyetê dide ber çavan bê ka ew çiqas bi karîgeriya îdeolojiya Realîzma Sosyalîst hatine nivîsîn.

Peyvên Sereke: Yekitiya Sovyetê, Realîzma Sosyalîst, Romana Kurdî, Êwra Kavkazê, Îdeoloji û Partîzanî

Sovyet Kürt Romanlarında İdeoloji ve Partizanlık

Öz

1917 Ekim Devrimi'nden sonra Sovyet Sosyalist Cumhuriyetler Birliği'nde yeni hükümet kültürel çalışmalarına başlar ve 1934'de Sovyet Yazarlar Birliği Kongresi toplanır. Bu kongrede Sosyalist Realizm devletin resmî sanat görüşü olarak kabul edilir. Sovyet yazarları ister istemez bu görüşün ilkelerine göre eserler ortaya koyar. Sosyalist Realizm birkaç ilke ile açıklanabilir ki bunlardan biri de "ideoloji ve partizanlık"tır. Bu ilkelerden yola çıkan sosyalist realistler güdümlü eserler yazarlar ve sanat ürünlerini bir doktrin ya da ideolojinin hizmetine sunarlar. Sanat ve sosyal hayata dair tespitlerini sosyalizme uygun olarak belirlerler; açık bir şekilde taraf tutarlar, diğer fikirleri reddederler. Sovyetler Birliği her milletin kendi dilinde eserler vermesine ve Komünist Parti'nin ideolojisine uygun bir şekilde kültür ve sanatını yaşatmalarına olanak tanımıştır. Sovyet Kürt yazarları da bu resmî ideolojiden etkilenecek eserler yazmışlardır. Bu çalışma, Sosyalist Realizm hakkında birkaç temel noktayı açıkladıktan sonra, bu akımın gölgesinde yazılan Sovyet Kürtçe (Kurmanci) romanlarında "ideoloji ve partizanlık" ilkelerine odaklanır. Bu çalışmada tarihsel örüntüye uygun olarak Sovyetler Birliği'nde yazılmış yedi Kürt romanı ele alınmıştır. Bu analizler, Sovyet kürt romanının realist-sosyalist akımın etkisinde ortaya çıkmasını ve bu eserlerde Sovyetler Birliği dönemi ideolojik etkisine hangi ilkelerle yer verdiğini sunacaktır.

Anahtar Sözcükler: Sovyet Birliği, Sosyalist Realizm, Kürt Romanı, Sovyet Kürt Romanı, İdeoloji ve Partizanlık

Ideology and Partisansip in Kurdish Novels of Soviet Period

Abstract

After the Revolution of October 17, in the Union of Soviet Socialist Republics, the new government began cultural activities and the First Soviet Writers Congress was held in 1934. In this congress, socialist realism was regarded as the official art view of the state. Soviet authors unavoidably produced works within this framework. Socialist realism emerged with a few principles and one of them is "ideology and partisanship". Soviet Kurdish writers were also affected by this ideology. In this study, after giving a few important notes about socialist realism, we will focus on the ideology and partisanship of Soviet Kurdish novels written in this current. For this study, in line with the historical pattern, we will deal with seven Kurdish (Kurmanji) novels written in the Soviet Union. We will analyze how ideology and partisanship are involved in these novels.

Keywords: Soviet Union, Socialist Realism, Kurdish Novel, Soviet Kurdish Novel, Ideology and Partisanship.

EXTENDED SUMMARY

Socialist Realism is a view that is seen as the continuation of realism and highlights its main development with Soviet literature, and it has led to the formation of a homogeneous literature in this country from the 1930s until the dissolution of the Soviet Union. In 1934, the Congress of the Union of Soviet Writers convenes. In this congress, Socialist realism is accepted as the official art view of the state. Socialist realists, who set off from these principles, write guided works and present their works of art to the service of a doctrine or ideology. They determine their determinations about art and social life in accordance with socialism; they openly take sides, rejecting other ideas. Socialist realism, like other literary theories, has a different feature as well as being influenced by philosophical movements. The theorists of this theory are mostly politicians, and the most important pillar on which this driven literature rests is the Bolshevik regime and the Communist Party. Socialist realists interpret events as the result of political ends; they see the novel as a tool for the development of ideologies and society. Writers who act in accordance with this theory defend Marxism and a permanent revolution and propose to look at art with Soviet ideology. For this reason, they behave more like a politician than a novelist.

The Soviet Union allowed every nation to produce works in their own language and to keep their culture and arts alive in accordance with the ideology of the Communist Party. The Kurds, who fled from the Ottomans and took refuge in the Soviets after political turmoil and migrations and started to establish a new life here, will also be affected by this new world order. This will be a unique opportunity for the Kurds, who have not had the opportunity to create a literature in their mother tongue before. Therefore, Soviet Kurdish writers will also be affected by the current official ideology in this atmosphere after the Bolshevik revolution and will start to produce Kurdish (Kurmanji) works in their own language by taking advantage of these opportunities.

This study will focus on the Soviet Kurdish novel, which is characterized as the Caucasus school, consisting of mostly Yazidi Kurds living in the Soviet Union. The aim of this study is to examine the seven novels of seven Kurdish novelists written in the Kurmanji dialect of Kurdish in the Soviet Union between 1935-1991 in line with the ideology and partisanship principle of the socialist realist theory and to determine their common points. The way in which ideology and partisanship take place in these works will be shown. In determining these common points, seven novels written in the specified range will be examined, common aspects will be shown in terms of content and their effects will be determined in line with ideology and partisanship. It will be seen that Kurdish writers also benefited from the opportunities offered by the Soviet regime and wrote most of their works within the framework of this theory. This study will be important and decisive in terms of revealing that the Caucasian Kurdish novel was formed with the ideological and political atmosphere of its own period.

Caucasian Kurdish literature can be evaluated in three periods. The first one is the “Beginning Period” and many conferences and meetings were held in this period covering the years 1920-1937 in terms of awareness raising activities. Kurdish alphabet studies were carried out and the first literary examples were given with this alphabet; newspaper studies were made. During this period, the first Kurdish Kurmanci novel, Şivanê Kurmanca, was written by Erebe Şemo in 1935. The second period

is the “Pause Period” and covers the years 1937-1955. The main reason for this naming is that many writers were displaced due to Stalin’s immigration and exile policy and not much work was produced in this period. A few theatre plays and scripts are prominent works of this period. The third period is the “Mastery Period” between the years 1955-1991. Writers returning from exile begin to write with great zeal to avoid the eighteen-year pause. The heavy conditions of the Stalin period eased and a relatively comfortable summer environment was created. The seven works that will be examined in this study are the products of this period.

Of course, the works to be examined are not limited to these, but seven novelists and seven works will be sufficient as a sample group for a study in this context. Data analysis in qualitative studies is a challenging method for researchers. The scarcity or absence of standard methods can be seen as a problem in social studies, and many researchers analyse such studies based on their own scientific background. This study takes care not to stay away from scientific methods as much as possible. For this reason, of course, novels were chosen as the primary source. In the analysis, the data were compiled by scanning method and the works were examined with Marxist criticism.

According to Marxist criticism, literary works are responsible for reflecting the ideology of the period in which they were written. The works examined in this study have also reached this conclusion. Each writer praises the Soviet regime in accordance with the ideology of the period and highlights the good and beautiful aspects of the regime. Feudalism and the bourgeoisie are harshly criticized, the revolution and the Communist Party are idealized. Lenin and Stalin are seen as great liberators and are always praised. All the bad characters are the sultan, agha, bey, emir and feudal, who are the representatives of the ruling class. They oppress people, exploit labour, and are far from human values. Novel heroes are created in a uniform way far from being a character. They fight against the ruling class, feudalism and the bourgeoisie; they fight with the sultan, the aghas and the beys. They do not have human weaknesses; they approach everything ideologically. They give courage to the people in desperate and bad times, they do not give up on their great goals and ideals, no matter how much they suffer. They always educate themselves, serve the people; they become a good example and saviour for the people. All these show that the Soviet Kurdish novel, like its contemporaries, exhibits an ideological and partisan attitude in this respect.

Destpêk

Li Rusyayê bi serketina Şoreşa Cotmehê û bi damezirandina sosyalîzmê ra realîzmeke nû ya civakî/sosyalîst derdikeve holê û ev yek jî di navbera civak û mirovan da têkiliyên nû û sincekî (etîk)yên civakî bi xwe ra tîne. Di huner û edebiyatê da armanceke civakî û berpirsiyariyek ava dibe. Bi vê berpirsiyariyê pêdiviyên gel bi rêyeke edebî dibe mijara hunerê. Realîzma Sosyalîst, şaxeke ji realîzmê ye û geşedana xwe bi edebiyata Sovyetê pêş ve biriyê. Di 1934an da Yekemîn Kongreya Nivîskarên Sovyetê dicive û biryarek tê girtin ku Realîzma Sosyalîst ji wê dîrokê pê ve dibe nêrina hunerî ya fermî ji bo Yekitiya Sovyetê.² Biryarên berbiçav ên ku di vê kongreyê da hatine girtin esasen rêgezên xwe, çavkaniyên xwe ji nameya Stalîn werdigirin ku ev name 2yê Berfanbara 1930an da ji bo Demjan

2 Ji bo agahiyên berfireh ên derheqa realîzma sosyalîst da hûn dikarin binêrin: (Oktay, 2008) û (Kurtulmuş, 1996).

Bedny hatiye nivîsîn. Li wir Stalinî nivîskar wek “endezyarên ruhên mirovan” şayesandiye (Tunalı, 1993:149-150) û ev yek jî di kongreyê da ji bo teoriya Realîzma Sosyalîst bûye rêgezeke bingehîn. Li gor vê teoriyê divê nivîskara/ê sosyalîst hişê civakê ava bike, civakê bi îdeolojiyê bixemilîne û li hember kapîtalîzm û dagirkeriyê serî hilde û xelkê bi rê bixe.

Realîzma Sosyalîst bingeha xwe ji nêrîna materyalîst werdigire û bi felsefê û îdeolojiya Marksîst şekil dide esasên xwe. Avakarên estetîka marksîst Karl Marks û Engels mijarên li gor texayyûlên berhemên edebî bi diyardeyên realîzmê sînor kirine. Lewra ye teorîsyenên Marksîst ên li pey wan rastîbînî kirine krîtera sereke ji bo nirxên edebî. Vê teoriyê di serî da huner wek amrazêke ragihandina îdeolojiyê dîtiye ji bo xelkê. Ev yek jî gelek caran encamên wisa dane ku hunermend tu fikarên estetîk nekirine mebest ji xwe ra û rastiyên mîsoger bûne armancên sereke ji bo realîstên sosyalîst. Ev tevger jî wisa rê li ber nivîskaran vekiriyê ku berhemên xwe bi vî şiklî bînin.

Edebiyata Sovyetê û teoriya wê ya Realîzma Sosyalîst bi vî awayî peyda dibe û armanc û naveroka wê rasterast ji aliyê kesayetên siyasî ve tê diyarkirin. Nivîskar berhemên xwe wekî berpirsiyariyekê dinivîsin. Ev helwest jî encamêkê bi xwe ra tîne ku naveroka wan dişibin hev. Rêzebûyerên berhemên her çiqas ji hev cuda bin jî hîmên tematîk, dem û mekanên bûyeran û lehengên wan rengê hev didin. Lehengên wan bi giştî endamên çîna karker in, keda wan tê xwarin ; kemasiyên civakê derdixin holê, aşkere dikin ; temsîliyeta kesên li hember kedxwarî û emperyalîzmê dikin. Divê di şerê li hember kedxwaran da bi ser bikevin û serfiraz bibin.

Edebiyata kurdî ya Sovyetê jî piştî gelek buyerên qewimî³ wek perçeyêke biçûk a edebiyata Sovyetê di çarçoveya nêrîna siyasî ya rayedarên Sovyetê de tê afirandin û taybetmendiyên realîzma sosyalîst di nav xwe de vedihewîne. Ji xwe piştî kongreya 1934an berhemênîneke din jî ne mimkûn bû, mefera nivîskaran nebû. Edebiyata kurdî ya Sovyetê jî ligel van geşedanan cara yekem derfeteke fireh dibîne û derdikeve qada cihana edebiyatê. Nivîskarên kurd bi şert û mercên demê girêdayî Partiyê (Partiya Komûnîst) bi karîgeriya realîzma sosyalîst berhemên xwe dinivîsin⁴ û bingeha romana kurdî diavêjin.

Di vê gotarê da ji bo diyarkirina xeta giştî ya karîgeriya realîzma sosyalîst li ser romana kurdî ya Sovyetê ji heft nivîskarên cuda heft roman hatine hilbijartin. Ev roman berhemên qonaxa dawî ya vê edebiyatê ne. Romana Erebe Şemo Jiyana Bextewar 1959an da, romana *Hewarîyê* ya Heciyê Cindî di 1967an da, romana Eliyê Evdilrehman Gundê Mêrxasan di 1968an da, romana Kurdê Rêwî ya Sehîdê Îbo di 1979an da, romana Dê û Dêmarî ya Egîdê Xudo di 1986an da, romana Bawerîyê ya Ahmedê Hepo 1990anda, romana Fîncana Ferfûrîyê ya Ezîzê Gerdenzerî 1990an da hatiye weşandin. Bêguman ji xeynî van berhemên jî gelek berhemên edebî hene ku mirov dikare di çarçoveya Realîzma Sosyalîst da binirxîne. Heta li gorî teza Çoban (Çoban, 2017:155) berhemên di dewra Sovyetê da hatine nivîsîn bi giştî realîst-sosyalîst in. Ev roman ji bo destnîşankirina îdeolojiyê û partîzaniya edebiyata Kurdî ya Sovyetê hatine hilbijartin û nivîskarên navborî jî di vî warî de kesayetên naskirî yên vê edebiyatê ne. Li ser bingeha Realîzma Sosyalîst ev berhem dê bîn analîzkirin. Gava ku behsa karîgeriya Realîzma Sosyalîst tê kirin ev nayê wê wateyê ku bi her layenê ve dê bê lêkolînkirin. Lewra teoriya Realîzma

3 Hatina kurdan a Sovyetê bi girêdayî siyaseta Osmanîyan ve girêdayî ye û şerê di navbera Osmanî û Rûsan da dibe sedema koça kurdan ber bi Sovyetê ve. Ji bo agahiyên berfireh hun dikarin lê binêrin (Çoban, 2017).

4 Wekî ku berê jî hatibû destnîşankirin, piştî kongreya 1934an Realîzma Sosyalîst dibe nêrîna fermî ya dewletê û nivîskarên kurd ên Sovyetê jî divê li gorî wê biryarê tevbigerin, berhemên xwe li gorî wê biryarê biafirînin.

Sosyalîst bi gelek rêgezan deng vedide.⁵ Lê ev gotar balê dikêşe li ser rêgeza îdeolojî û partîzaniyê û dîsa dahûrînên xwe yên derheqê van berheman da raberî xwendevanan dike.

1. Îdeolojî û Partîzanî

Di Realîzma Sosyâlîst da armanca sereke nîşandayîna rastiyê ye. Divê teorîsyenên vê nêrîne rastiyên partiyê bi awayekî xurt raberî xelkê bikin. Nivîskar jî bi vî şiklî rastiyên ku berhemên xwe da tesbît dikin bi awayekî sosyolojîk şîrove dikin û bi îdeolojiya hunera xwe diafirînin. Gelek jî wan beriya hunerê da fikara pêkanîna dozekê dikin û ji xeynî nivîsandîna romaneke baş armancên din datînin ber xwe. Pirsgirêkên welatê xwe û derdên gundiyan bi awayekî terefîdar carinan bi hezkirinê carinan bi xezebê tînin zimanî ; carinan tenê bi nêrinekê û carinan jî bi awayekî berfireh li ser disekin.

Realîstên sosyâlîst bûyeran wek encama armancên siyasî şîrove dikin û romanê wek amrazekê dibînin ji bo îdeolojiya xwe û ji bo pêşvebirina civakê. Li gor kesinan hemû mesele xirabî, dizîtî, neheqî û bêrêti ye û divê meriv balê bikişîne ser. Hin kes di pergala civakê da ji aliyê Marksîzmê ve hin guhertinên mayînde, heta şoreşê dixwazin. Ji romannivîsekî zêdetir wek rojnamevanekî alîgir û wek siyasatvanan tevdigerin.

Realîzma Sosyâlîst sîstema mulkiyeta şexsî û paşxana wê ya siyasî û hişmendî rexne dike û li aliyekî jî çî li hember civaka sosyâlîst be ji binî ve red dike. Ev teorî sîstema kapîtalîzmê û jiyana ku bi vê hişmendiyê ava bûye rexne dike ku bi vê erkê dibe partîzan (Akçay, 1998 :19-20).

234

Berhemên ku bi vî rengî hatine nivîsîn, herçiqas ji aliyê cûre û esasên xwe ve heta radeyekê ji hev cuda bin, dîsa jî di bin banê îdeolojiyê hevpar da dicivin. Ev yan pesna komûnîzmê didin yan jî diavêjin canê dijberên komûnîzmê yanê wan rexne dikin. Lewra berhemên edebiyata Sovyetê pincara enî çiyayî ne (Siniavski, 1967 : 29- 30).

Realîzma Sosyâlîst ne tenê xwedî qaîdeyên diyarkirî lê belê xwedî nêrîn û bergehên diyarkirî ne. Ev teorî pêşniyaz dike ku li dinyayê û li hemû mirovan bi îdeolojiya Sovyetê bê temaşekirin. Armanca wê ew e ku hunerê bike amraza partiyê.

2. Raçavkirineke Kurt li Ser Tradîsyona Romana Kurdî ya Sovyetê (1935- 1991)

Edebiyata kurdî û bi taybetî jî romana kurdî, berhemanîna xwe ya mezin û bibandor li dîyasporayê⁶ derdixe holê. Êdî dîyaspora ji bo romana kurdî dibe welatê eslî (Ahmedzade, 2004: 195). Kurdên ku ji welatê xwe sirgûn bûne û çûne dîyasporayê, nostaljiyên xwe û wezîfeyên xwe yên neteweyî bi nivîsandîne xwestine telafî bikin. Bi vî awayî xwestine ku çanda xwe biparêzin û ji bo dahatûya gelê

5 Li gorî Çoban rêgezên teoriya Realîzma Sosyâlîst bi giştî ev in:

“1. Îdeolojî u Partîzanî

2. Ked û Kedxwarin [istismar]

3. Lehengên Erênî

4. Romantîzma Şoreşger

5. Folklor

6. Dîn

7. Dîrokîti

8. Gelparezi

9. Mijaren Aboriye, Sistema Kolxoz û Sovxozan” (Betül Çoban, 2017: 10 - 22).

6 Derheqê dîyasporayê da ji bo agahiyên berfireh hun dikarin li pirtûka “Diyaspora Mekanları” ya Mînoo Alinia binêrin. Peyva dîyasporayê bêtir Ewropa tîne bîra me lê em qebûl bikin nekin dîyasporaya herî mezin ya kurdan li Kavkazayê ye. (Alinia, 2007)

xwe bixebitin. Ev yek kurdên Sovyetê da bi rehetî tê kifşkirin. Diyasporaya Sovyetê (ku êdî bûye wekî welatekî) ji bo kurdan bi taybetî jî ji bo kurdên Kurmanc dibe qada ronesansêkê.⁷ Bi awayekî şênber qedera kurdên Sovyetê diguhere. Piştî Şoreşa Cotmehê serkeftinên çandî û edebî xwe nîşan dide.

Jiyana edebî û çandî ya kurdên Sovyetê, nêzîkî heftê salî ye. Ev çand û edebiyat dikare bi sê êwran bê vekolîn.⁸ Her çiqas ji bo edebiyata kurdî ya giştî parvekirinek mimkûn nebe û wêneyeke hevqirtî nikaribe bê çêkirin jî, ji bo edebiyata Sovyetê ev yek mimkûn e. Ev parvekirina li êwran hem ji bo lêkolînan rêgezand dide ber destê lêkoleran û hem jî nîşaneyê pêşveçûyîna çand û edebiyatekê dide ber çavan.⁹

Êwra yekem (1920- 1937) di salên 1920î da bi xebatên perwerde û alfabezan dest pê dibe û nivîskar û rewşenbîrên wê dewrê hewl didin ku bingehekê çêkin ji bo zimanê edebiyateke nivîskî. Di salên 1930î da bi rêya edebiyata rûs û ermeniyana gelek wergerên bi kurdî tînan amadekirin. Bi ceribandînan her cure berhemana, edebiyata kurdî ya li Sovyetê bi “destpêk”ekê xwe nîşan dide. Di 1935an da yekem romana kurdî ya Erebe Şemo ya bi navê Şivanê Kurmanca tê çapkirin.

Êwra duyem (1937-1955), bi desthilatdariya Stalîn û qedexeyên wê demê tê pênasekirin. Êwra duyem jî dikare weke êwra “rawestî”ê bê binavkirin. Lewra di wê serdemê da pêşveçûna ziman û çanda kurdî tê sekinandin. Di dibistanan da perwerdeya bi kurdî tê qedexekirin û hemû dibistanên kurdan û akademiya perwerdehiyê tînan girtin. Gelek rewşenbîr, nivîskar û helbestvanên kurd ji kar tînan avêtin, tînan girtin û sirgûnkirin. Erebe Şemo sirgûnî Sibiryayê dikin; Heciyê Cindî, Cerdoyê Gêncî, Ahmedê Mîrazî, Cangîr Axa û Şamil Têmur desteser dikin û dixin girtîgehê. Ji ber wê ye ku di navbera van salan da li ser edebiyat û romanê zêde berhem nayên dîtin digel ku du berhevokên giştî ya nivîskarên kurd û berhevoka çîrokên Heciyê Cindî a bi navê Siva Teze (1947) hatibin weşandin jî.

Ligel van qedexekirinan şaxeke din piçek ronayî dide wê serdemê. Di 1937an de li gundê Elegezê Şanoya Dewletê ya Elegezê tê vekirin. Lîstikvanên ewil ji nav keç û xortên wê herêmê tînan bijartin. Kar û barên şanoyê ji aliyê dewletê ve tê finansekirin û şanogerên ermenî ciwanên kurd perwerde dikin. Nivîskar û şanonivîsên ermenî li ser hîmên zargotin û jiyana kurdan gelek şanoyan dinivîsin. Mem û Zîn a S. Taronsî; Ker û Kulik, Siyabend û Xecê, Keça Mîrikê û Gur Hesoyanê hin ji van in. Wekî din berhemên Rûs, Ermenî Gurcî û Azerîyan derdixin li ser dîkê. Herwiha berhema Celatê Koto Lur de Lur, berhema Heciyê Cindî Mîraz û berhema Cerdoyê Gêncî Çuşka Doxdiryê û Bira jî li van şanoyan tînan listin. Ev şano di 1947an de tê girtin lê dîsa jî di demeke kin de nêzîkî 30 pîyesan ve çandeke mezin ava dibe û kadroyên baş perwerde dibe ji bo dahatûyê.

Di êwra sêyem (1955-1991) da, edebiyata kurdî ya li Sovyetê, bi hewldanên mezin û piştrast careke dînan radibe li ser piyan û li hember rawestîna hijdeh salan bi awayekî tecrûbedar/xweytecûbe disekine. Lewra hêjayî gotinê ye ku wekî êwra “hostetî”yê bê binavkirin. Di wê serdemê de êdî polîtîkayên ser-

7 Her çiqas peyva diasporayê di bingeha xwe da fikrên neyînî bîne bîra me jî, hin lêkolera û nivîskara hemberî wî qasî ne. Diasporayê wekî qadekê dibînin: qada hişmendiyê. Yek ji wan jî Khaled Khayatî ye. Li gorî Werbner jî diaspora qada hişmendiyê ye, piraniya wargehan jî bi wê re eleqeder e. Homî K. Bhabha dibêje ku “diaspora, ji bo estetîka post-kolonyalê çavkaniyek e.” Ji bo agahiyên berfireh hûn dikarin binêrin: (Khaled Khayatî, 2009)

8 Di mijara parvekirina li êwran jî Eskerê Boyik, Tosinê Reşîd û Têmurê Xelîl sûd hatiye wergirtin. Bnr. (Boyik, 2012: r. 25-26; Reşîd, 2012:202-212, dnd. (brh.) Erbay, 2012, r. 202-212) û (Xelîl, 2014: r. 12-23.)

9 Parvekirina edebiyata kurdî ji bo hin lêkoleran hêja jî ne mimkûn e. Ferhat Shakely bi xwe jî, ku bi iddiyekê derdikeve dibêje ku wî hemû herêmên kurdan ber çav girtiye û ji bo edebiyata kurdî berhevkirineke giştî kiriye, wê yekê tam nekariye pêk bîne. Lewra edebiyata Sovyetan derveyî xebata xwe hiştiye û iddia kiriye ku romana kurdî di salên 1960î da derketiye holê. Lê ji bir kiriye ku romana yekem di salên 1930î da li Sovyetê hatiye nivîsîn û çap bûye. (Shakely, 1998).

dama Stalîn û tundiya li ser kurdî radibe, rewşenbîr û nivîskarên ku sirgûniyê da ne vedigerin welatê xwe. Di vê serdema sêyem da, di warê pexşanê da pêşketînen mezin çêdibin. Di destpêkê da ji xeynî Şivanê Kurmanca(1935) ya Erebe Şemo nimûneyên romanê peyda nabe û herwiha yên çîrokê jî. Lê ev rewş di vê serdemê da diguhere. Li gel Erebe Şemo, Heciyê Cindî, Emînê Evdal û Ahmedê Mîrazî; navên wek Eliyê Evdilrehman, Şehîdê Îbo, Egîdê Xudo, Ahmedê Hepo, Nadoyê Xudo Maxmûdov, Emerîkê Serdar, Sîma Semend, Wezîrê Eşo, Prîskê Mihoyî, Xelîl Mûradov (Xelîlê Çaçan), Mîroyê Esed, Tosinê Reşîd, Çerkezê Reş, Casimê Celîl, Ahmedê Gogê, Elîxanê Memê, Hamoyê Rizgo, Babayê Keleş û Vanîkê Elîxan bejn û bala xwe di warê pexşanê da nîşan didin.

3. Rengvedanên Rêgeza Îdeolojî û Partizaniyê

3.1. Jiyana Bextewar (Rewan, 1959)

Erebê Şemo wekî nivîskarekî kurd “bi şoret tê naskirin û nav û dengê wî çawa li welatê Sovyetê wisan jî li nava rewşenbîrên kurd ên wê demê da belav dibe” û wekî “bavê romana kurdî” tê pejirandin (Boyîk, 2007). Ligel neheqiyên hatine serê wî dîsa jî bi awayekî partîzanî romana xwe dinivîse û wekî tê dîtîn dev ji îdeolojiya xwe bernade. Her du romanên Erebe Şemo Şivanê Kurmanca (1935) û Berbang(1935) wekî otografiya wî hatine nivîsîn. Heta tê dîtîn ku Berbang bi awayekî zelal versiyoneke berfirehkirî ya Şivanê Kurmanca ye. Christine Allison jî ji bo Berbangê dibêje ku “...ne pirtûkeke cuda, lê venivîseke Şivanê Kurmanca ye” (Allison, 2014:145). Lehengê pirtûkê (yanê Erebe) ji bo Partiyê¹⁰ bi dil û can dixebite.

236

Romana Jiyana Bextewar (Şemo, 2015) piştî sirgûniya Erebe Şemo çap dibe. Rasterast nayê gotin ka ev roman jî wekî her du romanên berê otobiyografiya Erebe Şemo ye lê dîsa jî li hin deran bi awayekî teknîkî dikeve hin nakokiyên û xwe dide dest ku Misto -yek ji lehengên romanê- Erebe Şemo bi xwe ye: “Xortekî ji kurdan, navê wî Misto bû. Wî pak bi zimanê Êris û Ermenîyan zanîbû û bûbû uzvê Partîya Bolşevîkan û çî qirarîen partiyê hebû bi destê wî Mistoyî teşkîlata Bolşevîkan bi dizîka ve derbas dikir li nava Kurdan, Ermenîyan û paleyêd mayîn...” (r. 102). Misto lehengê sereke ye her du romanên wî yên berê (Şivanê Kurmanca û Berbang) ye û her wiha ye Jiyana Bextewar jî. Bi gelek nimûneyan tê dîtîn ku serboryên Erebe û Misto li hev tên: “Lê Misto kaxêz gişk kuta kiribûn, ew êdî ber bi jor de hildikişîya ber bi çadirê xwe ve diçû. Bi vî teherî Partîya Bolşevîkan îdêya Marks û Lenîn li nav esker û xebatçiyên belav dikir” (r. 112). Misto jî wekî Erebe di nav leşkerên Qazax da navbeynkariyê dike, ji ber ku çend zimanan dizane. Bi Bolşevîkan ra kar dike û ‘kaxez’ên partiyê di nava gundiyan, rêncberan û karkeran da belav dike. Di mîtînga yekê Gulanê da li ser xebatên partiyê diaxive û pesna Bolşevîkan dide û ji ber wê jî tê girtin.

10 Divê bê gotin ku hin termînolojiya kurdên Sovyetê di vê xebatê da hatiye bikaranîn. Wekî mînak di tevahiya romanên da navê Partiya Komûnîst ya Yekitiya Sovyetan bi navê xwe ye resen nehatiye bikaranîn, di dewsa wê da “Partî” tê gotin ku di gotarê da bi heman kontekstê da ev peyv gelek caran hatiye bikaranîn. Wekî din Hikûmeta Sovyetê jî gelek caran bi navê “Dîwan” an jî “Dîwana Sovyetê” hatiye bikaranîn ku heman aqubet ji bo wê peyvê jî derbasdar e.

Nivîskar di beşa “Şerê Împeryalîstîyê, Sala 1914an” da behsa şerî dike û heta sala 1917an tê. Şerê Cîhanê yê Yekem bi vî rengî dibe paşxaneyekê ji bo vê romanê. Li vir dîsa lehengê romanê Misto bi Partiya Bolşevîkan ra dixebite û tevî wan propagandaya komûnîzmê dike, xebatan dibe nava karkeran û leşkeran. Li hember burjuvaziyê xebatên wisa bi dil û can dike ku hevalên wî yên partiyê timî pesnê Misto didin. Propagandaya Lenîn û bolşevîkan di vê romanê da dibe mijara sereke ji bo nivîskarê sosyalîst. Romanê ji bo îdeolojiya xwe dike amrazekê û ji bo vê yekê jî lehengên xwe bi kar tîne û bi rêya wan fikr û ramanên xwe empoze dike. Mîxaylovê komûnîst gelek caran bi hevalên xwe yên partiyê ra diaxive û dibêje ku:

Gerekê em wisa bikin, wekî eskerên me berê tivingên xwe biguhêzin ber bi dîwana padşê ve, ber bi bûrjûvaziyê ve bikin, çimku ev şer wan dest pê kir ji bo kara xwe. Pale û gundî xwîna xwe dirêjin, lê burjûvazî, milkedar cêba xwe tijî dikin (r.104).

Yekê Gulanê ji bo karker û gundiyan rojeke girîng e û di vê berhemê da jî behsa wê hatiye kirin. Teşkilata Partiya Paleyên Sosyaldemokratîyê a Ûrisêtê (a Bolşevîkan) xebateke gumreh ji bo vê rojê dike. Lozung dinivîsin, parçeyên sor amade dikin. Wê çaxê cara ewil e ku ewqas miletên Kavkazê di bin destê Partiya Bolşevîkan da dixebitin, wekî birayan karê Eyda Yekê Gulanê dikin û kes li yekê din re bi çavekî nijadperest nanêre (r.110). Misto jî di vê mîtînga mezin da radibe ser dîkê diaxive, li gorî lozungan çî tê bîra wî behs dike û pesna şoreşê dide. Ji ber vê axaftinê jî ji aliyê diwanê ve tê girtin. Bi rêya bîranînên Misto yên li girtîgehê tê zanîn ku wî pirtûka Lenîn a “Pêşdeçûyîna Kapîtalîzmê li Ûrisêtê” xwendiyê û bûye bolşevîk. Baweriya kurdan bi Lenînî heye û wisa bawer dikin ku ew rizgarkerê wan e. “Erê weleh xwedîyê me kesîban Lenîn e, Partiya Bolşevîkan e, em gerekê îro gişk li Dîgorê bibêjin, dixwazin dîwana pale û gundîya” (r.126). Misto (êdî tê zanîn ku ew Erebb Şemo bi xwe ye) hevalên xwe hîn gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan kiriye. Li vir tişteki balkêş ew e ku nivîskarê romanê gelek caran tîne zimanî ku Misto bolşevîk e, şoreşgerê partiyê ye û her ji bo Dîwana Sovyetê û ji bo kurdan dixebite. Ev fikar hertim di nava romanê da derdikeve pêş. Ji ber ku Erebb Şemo piştî sirgûniya xwe her dixwaze ku bîne zimanî ku ew komûnîst e û sosyalîst e (Şemo, 2007: 7).

Li gundên kurdan bi serkariya Partiya Bolşevîkan û dewleta Sovyetê êdî jiyaneke nû ava dibe. Xebatên di nava kurdan da ‘rind, bi dil û can û komûnîstî’ derbas dibe lê kesên ku dixebitin nexwendî ne, nikarin gotinên Lenîn û Partiya Bolşevîkan bi zanebûna Marksîzmê- Lenînîzmê bibin nava kurdan. Pêwîstiya kurdan bi kadroyên xwenda hene lê hîn jî ew kadro amade nînin. Di 1927an da Misto diçe Moskovayê li cem ‘hevalê Stalîn’ û behsa rewşa gundên kurdan dike (r.221). Komîteya Merkezî ya Partiya Bolşevîkan vî karî dispêre Mixayîl Îvanoviç Kalînîn û li Yêrêvanê ji bo kurdan teknîkûma pedagojîyê û li Lenîngradê Fakulteta Karkeran (paşê ev fakulte dibe Înstîtûta Miletêd Biçûk a Sovyetîyê) tînen vekirin. Misto jî li wir dibe dersdar û ciwanên kurdan dişîne wan enstîtûyan ku perwerde bibînin, vegerin karê miletê xwe bikin û ji bo Partiyê bixebitin. Sehîd jî di vê enstîtûyê da dest bi xwendinê dike. Ew wisa baş dixwîne û hîn dibe ku “ji bo Katîbê Cabdarî ê Teşkilata Komsomolan li Înstîtûtê tê bijartin û dibe ûzvé buroya komîteya partiyê” (r. 222). Di havîna sala 1932an da Sehîd bi awayekî serkeftî xwendina xwe diqedîne û rojê da bilêta xwe distîne û vedigere gundê xwe. Di rê da yekî xerîb ji wî dipirse ka ew ji kîjan miletî ye. Gava ku Sehîd bersiva wî dide û dibêje ku ew kurd e, ew mêrik ji wî bawer nake. Ew ecêb dimîne ku berê yekî kurd bi cil û bergên rind, bi axaftineke xweşik û xwenda

nedîtiye. Nivîskar bi vî awayî nîşanî xwendevanan dide ku êdî kurd jî bi xwendina xwe, bi xebatên xwe û bi tevgerên xwe di nava civata Sovyetê da cih digirin. Bi lehengê xwe yê Şehîd jî vê yekê tîne zimani: “Erê gelek bawer nedikirin, wekî Kurd jî bêne Lenîngradê, lê bi saya Partiya Komûnîst û dewleta Sovyetê niha kurd jî têne vî bajarê mezin” (r. 225) û dixwînin.

3.2. Kurdê Rêwî (Rewan, 1979)

Kurdê Rêwî (Îbo, 2009) di 1959an da tê nivîsîn û di 1979an de li Yêrêvanê tê çapkirin. Nivîskar Şehîd Îbo armanca xwe ya nivîsînê di beşa “Sivte”yê de diyar dike:

Merivekî wexta tasa ava sar ji kanîkê vexwar gotî wê tucar bîr neke. Ew kanî bona me Oktyabra azadar e. Ewê li ber me dergê emrekî teze vekirin. Ewê da destê min qelema hana, ji wê jî ev nêtana dirijine ser kaxezê (r.16).

Ev yek bi tena serê xwe dikare mîsyona nivîskarî aşkere bike lê minetdariya wî li vir xilas nabe. Ew bi awayekî kronolojîk behsa çûyina êla xwe ya Ûrisêtê dike û dide zanîn ku ev ciyê şanaziyê ye:

Şûrê Romêyî neheq gundiye me’rûm li serê riya xistin. Sala 1920, wexta Ûrisêtê da beyreqa dimilmilî, tevî ermeniyê gundê cînar Ortila jî ji qetla Romê azabûn pê danîne ser şemîka emrekî teze. Roja îro jî, şikir ji erdê heta ezmîn, têr û tijî derbaz dikin (r.15).

Rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk di rûdanên piştî Şoreşê da bêtir di çarçoveya hizrî û çandî da derdikeve pêş ku mirovan ji têgihîştin û çandêke paşketî rizgar dike (Ergün, 2018a). Ev berhem jî rizgarkeriya şoreşê bi pesna Lenînzîzmê û partiyê bi awayekî aşkere vedibêje. Tekane rêya xilasbûnê di îdeolojî û fikra sosyalîzmê da dibîne. Lenîn ji bo van lehengan û ji bo kesîb û hejaran ‘rizgarker’ e; dîwana ku ew dê bîne ji bo çîna bindest hêviyeke mezin e. Baweriya wan a bi Lenîni gelek caran bi dubareyan tê nîşandan: “Ez ji giliyê Lînin zef bawer dikim, teva Rêvolyûsiya Sosyalîstiyê jî wê wira şemal bide. Ew şemalê te’riya qurna betreng bike” (r. 92). Bi vê baweriyê bi dil û can xebatên xwe dikin û xwedî li doza xwe derdikevin. Xaleke din ya balkêş jî ew e ku partîzanî û îdeolojiya karakteran dikeve pêşiya jiyana wan a şexsî û taybet. Gava ku karekî partiyê hebe yan jî xebatek ji bo şoreşê hebe dev ji hemû jiyana xwe berdidin û hewl didin ku wî karî temam bikin: “Niha dewraneke teze destpê dibe, em nikarin û îzna me jî tune, ku mîna berê derbaz bikin” (r. 37).

Nivîskar gelek caran wêneyên xirab ên sîstema zordariyê bi peyv û şibandînan nebaş radixin ber çavan û paşê jî wekî xilaskerekê behsa pêvajoya Şoreşa Bolşevîk dikin. Ev her du dîmen wekî reş û spî dijî hev in. Di realîzma sosyalîst da her bûyer û leheng bi vî şeklî reş û spî tîne şayesandin. Lehengên girêdayî çîna serdest ji kîjan milletê bibin jî bi gotinên nexweş tîne nasandin. Li hember vê jî kesên ji çîna bindest her çiqas gundî bin yan jî belengaz, kesîb bin dîsa jî bi awayekî xweşik û erênî tîne şayesandin. Derûniya wan tune û ew ji bo armancên nivîskarî di nav kontekstekê de tîne bikaranîn. Lewra her bûyer û lehengek ji bo ravekirina îdeolojî û fikran hene. Di vê romanê de jî gundiye hêjar bi nasîna partî û felsefeya wê dibin xwedîbawerî, wêrek dibin û li hemberî çîna serdest serî radikin. Zabitê karmendê dewletê di bin bandora fikr û pratîkên komînîstan da dimîne û ji bo reva girtîgehê alîkariya lehengekî din dike. Ev jî aliyekî din ê partîzaniyê ye. Di vê romanê da lehengekî cuda heye ku şayesandina wî balê dikêşe. Zurbe hem dewlemend hem jî kesekî qenc e û baş hatiye şayesandin.

Ev başbûna wî jî ji rabirdûya wî ya rênçerbûnê tê:

Zurbe bi eslê xwe va merivekî rênçber bû... Lê bextê Zurbe hinekî bi teherekî dinê lêxistibû. Ewî kirîn-firodana beg kiribû, xwe ra êpêce mal qazanc kiribû. Derê mala wî ber her kesîbekî vekirî bû. Sifra wî timê raxistî bû, ewî tasê ava sarjî bêy cînara venedixar (r. 31).

Nivîskar meyla xwe bi vî rênçberiyê ve girê dide. Lewra dê bê dîtî ku Zurbe dê tevî şoreşgeran bibe û bixebite. Heta Hemîd Beg û giregirên dewlemend ji vê yekê zehf aciz dibin û difikirin ka bi çi awayî Zurbê ji gundiyan biqetînin. Ji bo vê jî Meyana keça Zurbe ji kurê Keleşê rûspî ra dixwazin. Bi vî awayî dixwazin ku têtîliya wî ya kesîban qut bikin. Lê Zurbe vê yekê qebûl nake û ji ber fêl û hîleyên Hemîd Beg, Keleş û Pîr Mîrzoî terka gund dike û diçe gundekî ermeniyî. Li vir dostê kal û bavên Sûrênê ermenî aliyê wî dike û li wan xwedî derdikeve. Bi vî awayî Zurbe jî dikeve nava karên Partiyê û doza dîwaneke nû dike ku ew dîwan, dîwana kesîb û belengazan e.

3.3. Dê û Dêmarî (Rewan, 1986)

Romana Egîdê Xudo ya Dê û Dêmarî (Xudo, 2016) ji aliyê serlehenga xwe va ji yên din cuda dibe. Di vê romanê da serleheng jineke kurd e û destgirtiyê wê ji bo şerekî li hember burjuvazî û faşîzmê çûye û venegeriyaye. Bi destê nivîskarekî zîlam jîyan û derûniya jineke kurd¹¹ hatiye nivîsîn ku heta wê çaxê zêde mînakên wê nîn in ji xeynî Xatê Xanima Eliyê Evdilrehman. Di vê romanê da ne tenê pesindayîna sîstema Sovyetê lê belê hewldana fêmkirina derûniya jinekê jî cih digire.

Di vê pirtûkê da jî îdeolojiya Lenîn û partîzanî bi awayekî aşkere xwe dide der. Hertim danberhevek heye di navbera rabirdû û dahatûyê da. Derfetên ku hatine bidestxistin bi awayekî minetdar ji devê lehengan tînin bihîstin: “Salên dirêj derbas dibin. Gundê Mêrgesorê hatiye guhastinê. Hukumatê û daîrên curbicure mal û xaniyên nû çêkirine. Hemû tişt bi tevayî hatine guhastinê, cahilên gund pir bûne, dixwînin, bi jîyaneka nû dijîn û dixebitin.” (r. 41)

Şerê li hember burjûva û faşîzmê bi reşkirina Hîtlerî di romanê da gelek caran derbas dibe: “Belkî kilîta reş bi devê Hîtler bikeve, di rûyê vî şerî da ev xelqa hemû çawa dizêre!” (r.21) Bi vî awayî di romanê da gelek caran li ser zîmanê karakterên romanê dijayetiya Hîtler tê kirin û piştgiriya helwesta Sovyetê tê vegotin.

Wekî Ergün (Ergün, 2018b) jî destnîşan dike heman alîgirî di dijayetiya adetên kevin da jî tê kirin ku li pêşîya “jîyana teze” ya sîstema Sovyetê asteng in. Dema di bin karîgeriya Şêx Sefo da bavê Sîsê naxwaze keça xwe bide Saşa, Reşîd û Evêlîna Rubênovnaya wek nûnerên îdeolojiya Sovyetê bi axaftinên xwe vê meseleyê çareser dikin û pêşî li fitneya Şêx Sefo digirin. Ev jî dide zanîn ku Dê û Dêmarîyê da jî serdema piştî Şoreşa Bolşevîk û bernameya damezirandinê ya Sovyetê wek fonksiyoneke erênî cihê xwe girtiye.

3.4. Gundê Mêrxasan (Rewan, 1968)

Romana Eliyê Evdilrehman a bi navê Gundê Mêrxasan (Evdilrehman, 2012) cara ewil di 1968an de li Yêrêvanê, ji aliyê weşanxaneyê Hayastan ve tê weşandin. Eliyê Evdilrehman bi xwe jî destnîşan

11 Ji bo şîroveyeke berfirehtir derheqê derûniya jina kurd Karê da, hûn dikarin binêrin: (Aydogan, 2014: r. 223).

dike ku ev romana wî ya pêşîn e û di 1959an da dest bi nivîsînê kiriye û di 1965an de tamam kiriye (Evdilrehman, 2012:10). Dîsa şêweya xwe ya nivîsînê jî aşkere dike ku wî “îsbatên tarîxî yên qewmî” berhev kiriye û li ser wan hîman ev roman nivîsiye.

Di romana Gundê Mêrxasan da gelek lehengên şoreşger cih digirin. Wekî mînak Qasim kurê şoreşgerê navdar e û bavê wî Reşoyê Şamilê Kurdoxli “ji bo mehkemkirina qaydeyê Sovyetiyê, xweşjiyina cimaetê” (r.141) emrê xwe dide. Reşo endamê Firqeya¹² Bolşevîkan e û bi mêrxasî li hember “dijminê sinifê” şer dike û tê kuştin. Qasim jî wekî bavê xwe di refên Bolşevîkan da li hember çînen serdest şer dike. Qasim û Çolo bi hev re xebatên kolxozê bi rê ve dibin. Qasim gava ku xwendina xwe xilas dike wekî ciwanên din naçe xwendina bilind, dixwaze ku ji bo miletê xwe û Partiyê bixebite. Demekê xwe ji Xezala hezkiriya xwe dûr dixê ji ber ku Xezal keça Heso Beg e. Lê bi dû ra ku bi partîzaniya Xezalê dihesê û hezkirina xwe eyan dike. Dîsa tê dît ku partîzanî û îdeolojiya karekteran ketiya pêşiya jiyana wan a şexsî û taybet. Nivîskar qiseya lehengên xwe ya evîniyê jî bi şertekê vedibêje. Qasim bi şoreşgeriya Xezalê qeneh dibe û dildariya xwe aşkere dike.

Ji xeynî van Gogêya keça kurd jî di vê romanê da derdikeve pêş ku hezkiriya Evdilmecît e û Evdilmecît jî wekî gelek firqeyekî baş û Bolşevikekî xurt e. Gogê wêrekiya xwe di şerê ewil da nîşan dide, Riza Efendî bi kêrekî birîndar dike û tîne li berê la xwe. Çolo û giregirên êlê hemû wê pîroz dikin û gotina bi nav û deng ji bo Gogê jî dinehwirînin: “Şêr şêr e, çi jin e çi mêr e.” (r. 45). Keçên kurd jî wekî xortên kurdan di refên şoreşê da cih digirin, ew jî alîgirê Partiyê ne, di jiyana rojane da dîdar û berçav in.

Wekî piraniya romanên kurdî yên Sovyetê Gundê Mêrxasan jî ji bo danberhevê berhemeke nimûne ye. Di vê romanê da jî tê dît ku axa û beg bi zilm û tehdeyîyên xwe cih digirin. Hertim gundiyan dizêrin, ked û xebata wan dişelînin. Ev têrê nake dewletên serdest jî bi bac û xeracan gundiyan dubare dizêrin. Nivîskar panoramaya zordariya feodalîzmê disêwirîne û adetên xirab ên feodalîzmê, nezaniya vê serdemê û paşdemayîna feodalîzmê radixe li ber çavan. Elbet li hember vî kawdan û barûdoxî rizgarkeriya Şoreşa Bolşevîk, azadîxwaziya sosyalîzmê, ronakgeriya Sovyetê û pêşketina aboriya Sosyalîst jî bi şayesandîneke xweşbîn nîşan dide.¹³ Ev jî dide zanîn ku nivîskar meyla xwe ya îdeolojîk û partîzanî bi şêweyê meldar di nava edebiyata xwe da bi cih dike.

3.5. Hewarî (Rewan, 1967)

Yek ji romanên kurdî ya Sovyetê yê ku qonaxêke dîrokî dike mijara xwe ya sereke jî Hewariya (Cindî, 2008) Heciyê Cindî ye. Ev roman jî wekî yên din pesna sosyalîzmê dide û minetdariya xwe ya ji bo Lenîn û Sovyetê jî ji bîr nake. Heciyê Cindî di 1967an da vê romana xwe ya dîrokî-folklorîk diweşîne. *Hewarî* jî du paran pêk tê û li ser jiyana kurdên êzidî radiweste û ji vegotina wê jî diyar dibe ku aliyê wê ya didaktîk jî heye. Roman di van du beşan da bi awayekî kronolojîk behsa du sed salan dike.

Di Hewariyê da leheng ji bo çîroksaziyê bi awayekî reş û spî hatine şayesandin. Ev jî nîşan dide ku derûniya karakteran ne, lê armanca wan derdikeve pêş. Lehengên neyînî yanê temsîlkarên çîna serdest hertim bi nêrîneke neyînî tîne şayesandin; ew tim xerab in, bêrehm in, xerc û xeracan berhev dikin, kesib

12 Peyveke Serhedî ye û ji bo Partiyê tê gotin.

13 Ji bo danberheveke giştî ya li ser ducemseriya romana kurdî ya Sovyetê hun dikarin lê binêrin: (Ergün, 2017 rr. 644-661)

û belengazan dizêrînin. Lehengên erênî¹⁴ jî li hember vê rewşê; qenc in, baş in, dilsoz û dilpak in; bi hes-teke partîzanî xwedî li doza xwe derdikevin; ji bo armancên bilind dikarin bi rehetî canê xwe feda bikin.

Fêrikê lehengê vê romanê di tabloya panoramaya reş û spî da qisma spî sedî sed temsîl dike. Neviyê Emerîk Axa ye lê şoreşgerekî Partiyê ye. Di nava ciwanan da propagandaya Partiyê û Lenînî dike. Di refên Bolşevîkan da cih digire û li aliyekî ve jî helbest û nivîsan dinivîse, di kovar û rojnameyan da diweşîne. Yanê lehengekî tam anegorî nivîskarên sosyalîst-realist e. Ew hertim gundiyan hişyar dike ku “li Ūrisêta niha Lenîn bi pêş de hatiye, dibêje dinyayeke wisa bê çêkirin, wekî axa lê tunebin” (r. 360). Gundî jî ji Fêrikî zehf hez dikin, wî wekî temsîlkarê Partiyê dibînin û “pîrs didanê, pê şa dibûn, pesnê wî didan, pesnê wî didan wekî di ber me de xebitiye, ku dewlet bibe ya paleyan û gundiyan” (r. 53).

Wekî romanên din yên ku li Sovyetê hatine nivîsîn, Hewarî jî gelek caran bi gotin û pesinan Lenînî bi bîr dixê ka ew çawa li kurdan xwedî derketiye, çawa welatê Sovyetê ji bo van kesîb û belengazan bûye sitargeheke aram û wekhevîyê. Apê Moskov qala sêwîxaneyan dike û dide bawerkirin ku heke ew sêwîxane nebûna zarokên ji ber xelayî xilasbuyî jî wê ji destê wan biçûna. Li vir navê gelek zarokan jî bi lêv dike ku îro ew kes wekî damezrînerên ekola Sovyetê tên naskirin: Wezîrê Nadîrî, Xalîte Celalzade, Emînê Evdal û gelek kesên din. Cerdoyê Genco jî yek ji wan e ku demekê redaktoriya Riya Teze dike. Kamil jî derheqê vê yekê de dibêje ku “Dîwana me per û bask da wan û hezaran, hezaran mîna wan bi fire xist” (r. 44).

Hewarî wekî berê jî hatibû destnîşankirin pesna Lenînîzm û partîzanî da ji romanên din kêr namîne. Heciyê Cindî bi xwe jî şahidiya serboriya miletekî kiriye ku ew millet ji ber zîlm û tehdeyîyan direve û li welatekî din dihêwire. Lewra çiqas ji destê wî hatiye wî ev serborî nivîsiye. Ji ber wê ye ku gelek caran ev pesindayîn diçe heta minetdariyeke bêhempa û xwe aşkere dike.

3.6. Bawerî (Rewan, 1990)

Bawerîya (Hepo, 2013) Ahmedê Hepo cara ewil di sala 1990an da li Azerbaycanê tê çapkirin. Di nivîsîna vê romanê da nivîskar hewl daye ku li ser pîrgirêkên eşîrtî û qebîletiyê raweste. Ji dîroka kurdan mînak hildigire, fen û fêlên neyarên wan di tevna romanê da radixe li ber çavan û herwiha bawerîya dahatûyê jî ji bîr nake. Nivîskarê romanê di pêşgotina xwe da jî diyar dike ku ev berhem bi ruhekî welatparêziyê hatiye nivîsîn lê dîsa jî bêhna Yekîtiya Sovyeta berê jê tê (r.5). Ev jî nîşan dide ku bi lehengên xwe yên şoreşger û bi ruhekî partîzan ev roman hatiye honandin.

Di romana Bawerîyê da lehengên şoreşger bi ruhekî partîzanî tevdigerin. Lehengên wekî Sulhedîn ji bo Dîwana Sovyetê û ji bo Partiya xwe dixebitin. Piştî xwendina xwe tevî refên Partiyê dibin û xebatên kolxozê bi rê ve dibin. Sulhedîn gava ji şer sax vedigere ji ber mêrxasiya xwe ji aliyê Partî û Dîwanê ve bi “Stêrka Sor” tê xelatkirin ku ev ji bo wî asteke pîroz e. Hemû gundî wî pîroz dikin. Bavê wî Esed li gund şahiyên datîne. Ji xeynê Sulhedîn lehengên şoreşger jî hene û ew jî wekî wî tevdigerin. Hemû jiyana wan ji bo xebata Partiyê û ji bo pêşvebirina kolxozê û herwiha Sovyetê ye. Miraz, Mîrsevdîn û hemû lehengên şoreşger di tevgerên xwe yên partîzanî da wekî hev in û armanca

14 Ji bo agahiyên berfireh ên derheqa lehengên erênî da hûn dikarin binêrin: (Çoban, 2018: rr. 105-124)

wan jî herwiha yek e: pêşvebirina Dîwana Sovyetê û biratiya gelan. Li hember vê yekê jî elbet lehengên neyînî yên romanê jî hene ku ew di serî da axa û begên berê ne û herwiha dewletên serdest in. Li Sovyetê jî kesên li hember Partiyê tevdigerin, qanûnên kolxozan bînpê dikin, wekî dijminê gelan tên hesabandin û cezakirin.

3.7. Fîncana Ferfûrî (Rewan, 1990)

Romana Ezîzê Gerdenzerî ya Fîncana Ferfûrî (Gerdenzerî, 2015) di 1990an da tê çapkirin. Piraniya romanên kurdî yên Sovyetê bi danberhevan pêşî bi çarçoveyê reşbîn dest pê dikin û paşê xweşiya rêveberiya komünîst vedibêjin û pesnê Partiyê û sistema Sovyetê didin. Lê ev berhem wekî romanên din ên Sovyetê du welatan û du sistemen nade ber hev. Mekana romanê tenê welatê Sovyetê ye yanê Yêrêvan e. Bûyerên romanê bi texmînî di salên 1970- 1980î da derbas dibe û ev yek jî ji hevoka “ew pêncî-şêst sal bû, hem Baku hem jî Yêrêvan hêlînên biratîya gelan bû...” (r.58) tê derxistin. Roman ji vegotina dîrokekê zêdetir li ser evîniya du ciwanên kurd radiweste û vê yekê jî di destpêkê da bi straneke gelêrî xeber dide (r.7).

Têmûr xortekî kurd e û li Yêrêvanê di “înstîtûta doktoriyê” da dixwîne. Di şahiya pîrozkirina cejna Newrozê da keçeke kurd dibîne û dilê wî dikeve wê. Ev rastîhevhatina her du ciwanên kurd ku di govendê da jî dikevin milê hev, evîna Mem û Zînê bi bîr dixê. Wekî tê zanîn ew jî di şahiyê Newrozê da hev dibînin û ji hev hez dikin. Du ciwanên modern jî di vê romanê da, di şahiyê çandî ya kurdan da hev dibînin. Nivîskar her çiqas vê çîrokê eşkere neke jî hinartina bi vî awayî xwendevanan dibe heta wê dewrê û wê çîrokê. Lewra lehengên romanê bi kurdên parçeyên din ra di têkiliyê da ne, haja wan ji xebat û berhemên kurdên mayîn hene. Têmûr jî hertim qala pirtûkên kurdî dike, pesnê wan dide û xeber dide ku Emîn Bozarslan destana Ehmedê Xanî “Mem û Zîn” wergerandiye tirkî û çap kiriye (r. 43). Xuya dike ku nivîskar jî di dewra xwe da kurdên ji parçeyên din dizane û haja wî ji edebiyata wan heye. Bi şiklekî romantîk lihevraştatîna lehengên xwe jî dişibîne lehengên berhemêke din.

Meyrê keça profesorekî ye, nû dibistane xilas kiriye û dixwaze ku di beşa Tirkî de xwendina xwe berdewam bike. Ev her du ciwan piştî hin bûyeran destûra bavê Meyrê distînin û wekî heval hev dibînin ku heta xwendina wan xilas bibe. Keçeke kurd ji malbateke zana û xwenda ye û wê jî xwendiyê. Êdî lehengên jin ên xwenda û fehmdar li edebiyatê zêde dibin.

Têmûr û hevalên xwe di refên Partiyê da cih digirin û wekî partîzan û komsomolan xebatên Partiyê di nava xwendekaran da belav dikin. Havînan jî bi xwendekarên partîzan ra ji bo xebatê diçin gundan û aliyê pale û gundiyan dikin. Lehengên xwendekar di refên Partiyê da cih digirin, tevgerên xwe da an jî di fikr û ramanên xwe da wekî şoreşgeran wezîfeyên xwe tînin cih û minetdariya xwe jî nîşanî dewletê didin. Li bajarê Yêrêvanê xwendekar tevî karên Partiya Komünîst dibin û xwe wekî komsomol bi nav dikin. Têmûr jî yek ji wan e ku xwe li hember welatê xwe deyndar hîs dike û wiha dibêje: “Em komsomol û welatperwer in, borc û wezîfeya welat datîne li ser milê me, em nikarin cîbicî neynin” (r.54). Ev ciwanên komsomol di enstîtûyan da şahî li dar dixin û bi rê ve dibin.

Di romanê da cara ewil derheqê Stalîn da gotineke xirab derdikeve pêş. Dewra wî bi terorîzmê tê binavkirin û ew jî wekî dijminê gelan tê nîşandan (r. 41). Lê dîsa jî di tevahiya romanê da li hember

vê gotinê tevgerê an jî gotineke din nayê dîtin. Dibe ku partîzanî û baweriya nivîskarî rê nade ku tevahiya sîstemê rexne bike û ew jî kirinên Stalîn “şexsî” dibîne û dinirxîne.

Encam

Derfetên rejîma Bolşevîkê rêyeke berhemanîna çandî û edebî vedike ji bo kêmeteweyan û herwiha ji bo kurdan jî. Kurdên ji welatê xwe yên eslî dûr ketî di nava van derfetan da bi şiklekî “bihuştane” dest bi xebatan dikin û cara ewil edebiyateke tekûz ava dikin û her wiha edebiyatekê diyariyê milletê xwe dikin. Romannivîsên kurd yên Sovyetê bi vê mecalê û bi hêmayên xwe yên di vê gotarê da dest-nîşankirî, bi helwesteke îdeolojîk û partîzanî tevdigerin. Ev helwest carinan bi pesnandina Lenîn, carinan bi îdeolojiya Bolşevîkan û carinan jî bi minetdariya sîstema Sovyetê derdikeve pêş. Ev edebiyata mêldar bivênevê bi tezekê tîn nivîsîn. Nivîskar bi şêweyê berawirdî sîstema berê rexne dikin û pesna pergala nû ya Sovyetê didin, romanên xwe rasterast dikin qada propagandaya îdeolojiya Sovyetê. Her wekî tê dîtin ku ev berhem yekalî û yekrengî ne, çî xirabiya sîstemê û Partiyê tune ye. Her daîm jiyaneke bêhempa û bihuştane dide mirovên xwe. Tenê di romana Fîncana Ferfûrî da rexneyeke heşifi li ser sîstemê xuya dike lê ew jî ne bi îddiayeke xurt lê bi hevokên hêjar û lewaz. Ev jî nîşaneyê îdeala nivîskarî ve girêdayî ye lewra ji bo kiryarên xirab tenê Stalînî suçdar dike. Yanê rexneya sîstemê nîn e, reşkirina şexsekî ye.

Lehengên partîzan û îdealîst hertim li dijî çîna serdest, li hember axa, beg û dewlemendan têdikoşin. Ew, ne bi hestên xwe yên mirovane lê belê bi hişmendiyeke îdeolojîk tevdigerin. Di rewşên tarî û bêhêvî da cesaretê didin gelê xwe; herçiqas êş bikişînin û tenê bimînin dîsa jî tu carî ji armanca xwe û jî îdeala xwe ya mezin dûr nakevin û dev jê bernadî. Ev leheng ji bo wezîfeyên xwe û armancên xwe dijîn, hakimî nefsê xwe ne; xwe baş perwerde dikin, baş dixwînin û ji bo gelê xwe dibin mînakên baş û rizgarker. Yanî lehengên van romanên ji bo dahatûyê, ji bo jiyaneke îdeal û sosyalîst têdikoşin.

Berhemên vê edebiyatê bi xetên xwe yên giştî ve ji bo edebiyateke mêldar hatine berhemanî û bi angaştê çêkirina îdealekê tevdigerin. Lehengên wan bi tîpekê hatine vegotin û derûniyeke wan a şexsî nîn e. Ew dikarin jiyana xwe ya şexsî û taybet feda bikin ji bo îdeolojiya xwe û jî bo jiyaneke partîzanî. Bêguman ev daneyên ber destan jî nîşanê didin ku romanên kurdî yên Sovyetê bi îdeolojiyekê, bi hişmendiyeke partîzanî hatine nivîsîn; bi şêweya xwe ya mêldar xwedî tezekê ne.

Çavkanî

- Ahmedzade, H. (2004). *Ulus ve Roman*. Stenbol: weş. Pêrî.
- Akçay, C. (1998). *Hannâ Mine'nin Romanlarında Toplumcu Gerçekçilik*. Teza Doktorayê ya Neçapkirî. Ankara: Zanîngeha Gaziyê Enstitûya Zanistên Cîvakî.
- Alinia, M. (2007). *Diyaspora Mekanları*. Stenbol: Avesta.
- Allison, C. (2014). *Otobiyografi, Serborî û Romana Kurdî: Erebe Şemo û Peyrewên Wî. Ş. Kurt (werg.)*. Wêje û Rexne j.2, 133-152.
- Altug, F. (2011). *İstinat Duvarı Olarak Cezmi: 'Tarihe Müstenit Hikaye'*. Z. Uysal (Ed.) *Edebiyatın Omzundaki Melek* (149- 206). İstanbul: weş. İletişim.
- Aydoğan, İ.S. (2014). *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*. Stenbol: weş. Rûpel.

- Boyik, E. (2012). Çanda Kurdên Sovêtê. Stenbol: weş. Deng.
- Cindî, H. (2008). Hewarî. Amed: weş. Lîs.
- Çoban, B. (2017). Şopên Realizma Sosyalîst Di Romanên Kurdî Yên Sovyeta Berê De (1935- 1991). Teza Masterê ya Neçapkirî. Mêrdîn: Zanîngeha Mardîn Artukluyê Enstitûya Zimanên Zindî yê Li Tirkîyeyê.
- Çoban, B. (2018). Lehengên Erênî û Şoreşger di Romanên Kurdî yê Sovyetê da. Wêje û Rexne j. 9-10. 105-124.
- Ergün, Z. (2017). Ducemseriya Realizma Sosyalîst di Romanên Erebe Şemo û Heciyê Cindî De. e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR) c.9 j.2. 644-661.
- Ergün, Z. (2018a). Fonksiyonên Hevbeş û Zincîreya Rûdanê Di Vegêrana Edebiyata Kurdî Ya Sovyetê De. e-Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi/Journal of Oriental Scientific Research (JOSR) c.10 j.3. 805-818. (2018b). Taybetiyên Vegêrana Edebiyata Kurdî ya Sovyetê. Mukaddime 9(1). 133-150.
- Evdilrehman, E. (2012 a). Gundê Mêrxasan. Amed: weş. Lîs.
- Gerdenzerî, E. (2015). Fincana Ferfûrî. Diyarbekir: weş. Lîs.
- Gorki, M. (2011). Sanatta Sosyalist Gerçekçilik. İstanbul: weş. Payel.
- Hepo, A. (2013). Bawerî –Dengek Ji Rêzeçiyayên Elegezê-. Stenbol: weş. Aram.
- Îbo, S. (2009). Kurdê Rêwî. Stenbol: Avesta.
- Khayafî, K. (2009). Mağdur Diasporadan Sınır-ötesi Vatandaşlığa mı?. Stenbol: Avesta.
- Kurtulmuş, A. (1996). Politika ve Sanat. Stenbol: Avesta.
- Oktay, A. (2008). Toplumcu Gerçekçiliğin Kaynakları Sosyalist Realizm Üzerine Eleştirel Bir Çalışma. İstanbul: weş. İthaki.
- Reşîd, T. (2012). Sovyetler Birliği'nde Kürt Edebiyatı. V.Erbay (Ed.). İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat (202-212). İstanbul: weş. Ayrıntı.
- Shakely, F. (1998). Modern Kürt Öykü Sanatı. İstanbul: Avesta.
- Siniavski, A. (1967). Sosyalist Realizm. İstanbul: Habora Kitabevi.
- Şemo, E. (2015). Jiyana Bextewar. Diyarbekir: weş. Lîs.
- Şemo, E. (2007). Hopo. Stenbol: weş. Lîs.
- Tunalı, İ. (1993). Marksîst Estetik. Stenbol: weş. Altın Kitaplar.
- Xelîl, T. (2014). Antologiya 35 Helbestvan û Nivîskarên Kurd ên Sovyetê. İzmir: weş. Na.
- Xudo, E. (2016). Dê û Dêmarî. Stenbol: weş. Nûbihar.